


Welat
13
01/09/2014
Çandî - Giştî - Serbixwe

# Welat

## Qamişlo...
### Jiyana ku bi viyanê dibişkive

*Kovara* **WELAT**
Çandî- Giştî- Nîvmehane

*Sernivîser:*
**Aras Yûsiv**

*Desteya rêvebir:*
**Xweşnav Heso**
**Helbest Yûsiv**

*Dizayner:*
**Hesen Berzencî**

**Têbînî**: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediyê xwe ne û nivîskar berpirsê wê ye

*Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne*

**ji bo têkiliyê:**
welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

# PEYVA WELAT

## Li ser xêrê be

**Aras Yûsiv**



*Di van rojên zehmet de ku di ser Rojavayê Kurdistanê de derbas dibin,her tişt bûye zehmetiyek,ji peydakirina avê bigire,û di peydakirina cereyeke xaz û hinek elektrîk de derkeve,û di nav de em jibîr nekin peydakirina xwarinê bo çi malbatê ji ber gelek hene ku neçarin ji bo peydakirina taştiyekê an firavînekê kedeke mezin bikin an jî hinek xêr bi wan were kirin ji ber kar nemaye û eger mabe jî kêm e.*

*Di nav van rewşên zehmet de, em jî wek saziya Welat karê xwe dikin û hewl didin çanda me zindî be çi bi riya kovar an radyoya Welat be,karmendên saziyê îro gelek kedê û zehmetiyê jî dibînin ta ku karîbin karê herdû pirojeyan bi serî bînin,carinan bo peydakirina elektrîkê bo vêxistina radyoyê karmendên Welat di zehmetiyên mezin de derbas dibin,carinan jî bo nivîsandina raporekê an nivîsekê bo kovara Welat nûçegihanên kovarê neçarin li bêtirî cihekî karê xwe bikin ji ber carinan Internêt heye û elektrîk tuneye û carinan berovajî wilo û carnan herdû jî peyda nabin.*

*Di rewşeke wisa zehmet de ji tunebûna her tiştî û viyanekê ku dixwaze tiştekî bike em di saziya Welat de hewl didin ku hebin bo karîbin li gora şiyanên xwe hinekî dilsoz û wefadar bin bi çanda ku em xwe bi wê didin naskirin.*

*Tevî hemî zehmetiyan..karê me berdewam dike..û tiştê ku bêhna me fireh dike dema ku her karek bi dawî dibe û em di saziyê de ji hev re dibêjin Li ser xêrê be,û em nas dikin ku heman zehmetî li pêşiya me ye di karê bê de.*

*Ev zehmetiyên ku derbas dibin di karê saziya Welat de bi hezkirina ku em karibin tiştekî bikin berdewam dibe û hêvî her roj geş dibin ku sibe wê rewş baştir be û bi zehmetiyên kêmtir karê me berdewam bibe.*




تبنّى ثورة
adopt a revolution

# Ronî

Kawa Heso



Bi xişxişa darên ku bi min re di hewşa mala me de mezin bûne,ez wan çavên xweyî nazik ji xewê vedizim,û bi rengerengiya tîrêjên elendê re ez çavên xwe dixemilînim,asîmanên şîn,zerzûrên reşbelek,şaxên darê,çend ewrên biçûk û belavkirî,kerwanên teyran,ronî, ronî û ronî mijûlên min himbêz dikin,di ber de (pisîka ku berî çend mehan çavê wê bûbû nîşana kevirên zarokan) mîna xatûnekê tena tena li ser kelpîçên dîwarê hewşa me dimeşiya,di heman demê de berê xwe da min û çavê xwe xiste çavên min de,min jê re got kitika pirç sipî dibe ku tu li şar û welatan geriya bî,û te deşt, mêrg û çîmen,çol û çiya,biyaban û gulîstanên Buharê bi herdû çavên xwe dîtibe û ez xweş bawerim ku tu baş dizanî ku du çav tiya xweşiya jiyanê naşkênî… dengek ji dûr ve tê.. „Elî, Elî“ .. xalê mine.. „libê xalo“.. „Elî rabe da tu hêdî hêdî xwe amede bikî, em îşev diçin Turkî“, „bila xalo ez têm“... „xalo tu dibînî îro çi rojeke xweşe ezê îro çavên xwe li hemû zikakan bigerînim,li hemû kesan,zarokan,mêr û jinan,kalepîran, bazirganan,karmendan,hevalên min ezê îro çavê xwe têr bikim dibe ku ez carek din wan nebînim“… Roj xwe li xwe dipêçe,û hêdî hêdî diçe ava, ez jî buxçika bîranînên xwe dipêçim û davêjme pişta xwe,û dil şikestî û bi hisret bi xalê xwe re berî didne sînorên êşê,gavên xwe hûrik hûrik davêjim,serma xwe li rêka me digerîne û tarî pêre pêre xwe tal dike,di wê tariyê de çavê min li cemedana rêwiyekî dikeve ku bi têlên sînor ve xwe germ pêçaye… Ji nijka ve dengê xalê min bi dengê fîşekên cendirmên Turk ve di serê min de tevlûhev dibe,Elî zûke,fizfiza fîşekan, teprepa ling û destên me,helke helk,bê dengî,dîsa dengê bilind,serma, fizfiz,zûke,Elî,zûke,Elî,Elî... nema deng tê min,fizînîk drêj,ez li erdê dirêjbûme,ez tişkî nabînim,hemû laşê min sare lê tenê çavên min germin, çavên min êdî dişewitin,çavên min êdî diperitin,xalooo,xalooo çavên min peritîn xaloo,Elî zûke,xaloo ez tişkî nabînim û çavên min diperitin..xalê min bi ser min de tê destê xwe dide riwê min ku çawa xwîn bi riwê min de diherike...Bi qêrîna xalê min û xelkên ku bi hewara min ve hatin,û bi êş û şewata çavên min re,wêneyên jiyana min di sawîrê min de diçin û tên,ez, xuhên min, lîstikên me,kenê dê û bavê min,hevalên min, dibistana min, Hemû mirov û dost,av,ewr,tav û renge rengiya rojê,ronî, ronî û ronî..

# Kurdino! bibin xwedî hêz.. dîfaktoyê bi sepîn in?

**Dr. E. Xelîl-Sozdar Mîdî**

*Wergerandin ji erebî:*
**Mihemed Hesko ( Birasoz)**

Yek ji bingeh, ango stûnên herî giringên dîrok a sîyasîya cîhanê ew e, sepandina dîfaktoyê ye, ev di pêwendiyên siyasî de rastîya herdemî ye, û weha diyar e ku dê rastî ya herdemî jî bimîn e, û eger ne weha ba, ma bi çi mafî, aşûriyan xwe bi ser çend gelên, ji herêm a Zagrosê de bigre, û ta welatê Misrê sepandin û hikum lê wan kirin? Û bi çi mafî, Farisan desthilat a xwe bi ser gelên, ji çiyayên Hindokoşê de bigre, û ta welatê Yûnanistan û Misrê sepandin û hikum kirin? Û bi çi mafî, Skenderê Mekdonî desthilat a xwe biser gelên, ji welatê Yûnanistanê de bigre, û ta bakurê Hindistanê sepand û hikum lê wan gelan kir?

Herusa bi çi mafî, Roman an desthilat a xwe bi ser gelên, ji bakurê Kurdistanê de bigre, û ta Birîtanî ya yê de sepandin û hikum kirin? Û bi çi mafî, Ereban desthilat a xwe bi ser gelên, ji sînûrê welatê Çînê de bigre, û ta welatê Spanî ya yê de sepandin û hikum kirin? Û bi çi mafî, Osmanî yan desthilat a xwe biser gelên, ji Kurdistanê de bigre û ta sînûrê welatê Mexribê de sepand û hikum kirin? Û bi çi mafî, giravên Birîtanî ya yê bûn împratoriyet a ku ro lê danager e û naçê ava? Û bi çi mafî, niha çiwar dewletan xwe bi ser Kurdistanê sepandî ye? Û bi çi mafî, niha Amerîka siyastên xwe biser yên din de, disepîn e?

Ev hemû û ji bilî van jî, ne xwedî mafbûn, lê belê xwedî hêzbûn , û dîfakto kirin maf û bi ser xelkê de sepandin, û kî nerazî ye bila serê xwe li dîwaran xîn e.

Kurdino.. li bakur û başur, li rohilat û roava, ji bilî bijarde ya sepandin a dîfaktoyê bi ser dagîrkerên welatê me de, bi dest we de nîn e, û bi bê razîbûne me, alayên xwe diser me re hildan e, herusa li me qedexkirin e ku, em karbirêkirê serwet û samanê welatê xwe bin?

Xwendin anko şirovekirin a rast û dirust a dîrokê ew e, herusa felsefe ya siyasî ya rast û dirust ew e, û ji bilî vê yekî jî, gotinên vala ne.. gotinên vala ne, di cîhan a siyasetê de, bi qasî ku em xwedî hêzbin, ew qas jî, em dê xwedî mafin bin, erê apê Reşo tu çiqas hêja bû, dem a tu li nav gundên bakurê bajarê Helebê li devera Babê di nîvê sedsal a bihurî de, tu digerîya û te digot: Zor zan e, devê tifingê mor zan e? hemûyan wek dînek sêrî te dikirin û ji te re digotin, Reşoyê Dîn! Lê.. apê Reşo ya rast, tu yek ji hişmendên mezin bû.

Erê birano..em hîn di cîhanekê de ne, ku têde hêz maf e, û yutûbî ya Komar a Bextwer dê tu çarî neb e berdest û selmandî, û her û her felsefe ya siyasî a rastî tenê hêz e, ku dagîrkerên Kurdistanê pê bawer dikin, û her ew felsefe ye ku hêzên mezin di cîhanê de birêve dibin û bicih dikin.

Kurdino… kurdên rohilat, eger win li bend a dilovanîya melayên faris an e, ta roja peydabûna Xwedanê Demê ligor sawîr û got e gotên wan, winê ji bilî poşmanîyê, çi tiştî din bi dest nexin û neçin in.

Kurdino..kurdên başûr, eger win li bend a Sîstanî - Haris El-darî – Malikî - El-Mutleg û hevalbendên wan in, win dê 140 salên din bi mîn in, û winê bicihkirin a maddeya 140`î ya xapînok nebîn in.

Ey kurdên bakur..eger win li bend a roja vejîna Gorê Sor papîrê Toranî ne, ku ji gor a xwe ya li Mengolî ya rab e, ta win azadîya xwe bidest ve bîn in, winê ji bilî xewin û sawîran tiştekî din, bi dest nexîn in.



Ey kurdên roava, eger win li bend a roja ku, Mîşêl Efleq û Zekî Ersozî ji gorên xwe rabin, ta ku azadîya xwe ji rijîma Ba,as û herusa ji dijberîyê bi dest bîn in, winê ji bilî xewin û xeyalan, ne çin in.

Ey gelê kurd, hêzê bi dest xwe ve bîn in, tenê ew dermanê efsûnî ye ku wek wî çi tiştî din nîn e! û Pişt re dîfaktoyê bi sepîn in, tenê ew felsefe ya ku hemû hêzên mezin û biçûk li cîhanê, rêzê lê digrin.

Lê win ê çawa, (hêzê) ew dermanê efsûnî bi dest xwe ve bîn in!?, winê tenê bi pêkanîn yekîtî ya xwe, hêzê bi dest xwe ve bîn in!

Yekîtîya xwe, li her parçeyekî dagîrkerî, ji welat pêkbîn in.

Yekîtîya xwe, li Kurdistan a mezin pêkbîn in.

Lêveger û serkirde ya xwe ya bilin pêkbînin.

Tenê, ew rê ya rizgarî yê ye!?


Û Çi dib e bila bib e, divê Kurdisatnê rizgar bib e!


## Dilê welatê min



**Narîn Omer**







Xewna me tenê ewe…


Xewneyên me tenê di qaqila du xewneyan de dinivin, nabin sisê, xewna yekem ewe kû em di himbêza Eletrîkê “Kehrebê” de semadar bibin demeka dirêj de bê kû “Avsark” bitebitê bikê, bê Kû “Tilivzyon” bê lîlînê, û perwan vîzevîzê dijwartir bikê. Belê beriya kû endamên can û cendik reqis û sema dînbûniyê xurtir bikê.

Xewneya didwan ewe kû em dipaxla “Serşokê” de rawestin û em li ber pêlpêlokên ava boş serî bişûn û bi şûştinê re em bi dest stran û lawikên botanî û koçerî bikin û ezmûna deng nas bikin. û em ji şûşeya rengîn ava cemedî û zelal binoşin heta kû em giyanê dil û ramanan mestxweş bikin.



Belê du xewn bîroka hişyarbûn û xewnerojên me bê hempa didexdixînin piştî bîroka hizreyan ji erezo û omîdan vala bûye, ew erzoyên şêlopêl yên kû qerebalix di hiş û dil de peyda dikirin.

Niha tenê du xewn mana, wax çiqas em bi sansin û em bextewarin di van rojên bedew de, di van salên bi rûmet de.



# BIZDIDIM

*berevkirin û şirovekirin ji Folklorê Zarokan*

**Salihê Heydo**

Xwendavanên Hêja û dalal , ez dixwazim di vê hijmarê de ji kovara welat ji we re nîmûneyekê ji Sirûdên Lîstikên Zarokan şirovebikim , çawa tê Zanînê ev Sirûd li ser Zimanê Zarokên biçûk tê gotin , bi teybetî yên keç
dema ku li hev kom dibin û ji xwe re bi lîstika werîs dilîzin .
du keçik werîsê xwe li ser qadê dirêj dikin , û her yek ji wan ji aliyê xwe ve ji cem sere werîs pêkên xwe li dû hev davêjin , û pêre vê sirûda jêrîn dibêjin , pêka kê ji wan li ser pêka ya dîtir

**Sirûd**

***Bizdidim û badidim badidim û radidim***
***herdûçavan Kildidim Kil ji Kilê buharê***
***Av ji Ava çinarê çinara xuşxuşokê***
***li gor bejna Medokê Medoka ezmana***
***bi Kiras û xeftana xeftanê xelo ye***
***li gor bejna keko ye keko çûye Mêrdînê***
***çi tine çi nayîne Heft bare Kakil tîne***
***li ber Keçikê direşîne Keçka Mîrê beraza***
***Şûr kişandî Heftga Keko Meydanê dixwaza***
***Ji bo xatirê hev qasa***



# Keserên Dil

Dilşa Şêxanî



*tevî ku.. li derve*
*barane…*
*û…li hundir..*
*evînek sare…*
*her tiştî..*
*himbêz dike…*
*ez bi agirê*
*bîranînan…*
*xwe…*
*germ dikim….*
*û tevî..*
*dînbûna te…*
*ez xwe li ber*
*tîna evîna te*
*nagirim…*
*dişewşinim..*
*nizanim wê kengî*
*sibatoka dînik..*
*bi te re bikene…*
*û… dûrbûna te..*
*li min nêzîk bike…*
*hêvî û xewnên min*
*ji dafên nervîna*
*dixsok*
*rizgar bike*
*hêsan bike…*
*kovanên*
*min…*



Welat
Hejmar 13
01/09/2014

# HESEKÊ Û REWŞA TENDURISTÎ

*Raman Îsa*

Ji despêka şoreşa Sûriyê,û ta niha roj bo roj rewşa vî bajarî bi giştî ji hemû hêlan ve ber bi aloziyan ve diçe, û yek ji van aloziyan tê xuyakirin di warê tendurstiyê de,ji ber di dema dawî de hin bi hin tenduristî bi zehmetî pêk te,û ji ber gelek sedeman,li gorî nerîna hin ji welatiyên bajêr sedema sereke ewe ku dergehê penaberiyê hat vekirin. Nexasim ji ber Rewşa ewlekarî ya têkçûyî,beşekî mezin ji pijîşkan penaber bûn û berê xwe dan Başûrê Kurdistanê an jî Ewropayê,ev ji hêlekê ve, û ji hêleke din ve jî, tunebûna derman û buhabûna nirxê derman kirinê li nexweşxaneyên fermî .

ji ber vê yekê, pirojeyek hat ragihandin ji aliyê girûpek ji pijîşkên Kurd,Ereb û Xiristiyan… ku navendeke tenduristiyê were vekirin,û ev piroje çû serî bi kêfxweşî û piştgiriya her du Encumenên Kurdî, bêyî ku her du alî tu alîkariyan pêşkêş bikin.

di 16\5\2013 de ev navend hat vekirin,ji dema vekirina Navendê û ta niha hejmara nexweşan gihaye 10,000 nexweş, herweha ji ber ku ev Piroje ji bo xizmetguzariyê ye,nirxê dermankirînê erzane ku dighê 400 L.S tenê.

herwiha temenê kirîna demanan li dermanxaneyên fermî buha ye, ev jî sedemeke ku dermanxaneyeke biçûk li vê navendê hebe, ji boyî alîkariya nexweşan .




di hevdîtineke taybet de li gel kovara Welat, yek ji girûpê pijîşkan Dr. "Salar Mi'o" ragihand ku ji ber têkçûna ewlekariyê li bajêr,û buhabûna nirxê derman li nexweşxaneyan,me ev piroje ji xwe re kir armanc,da ku em karibin alîkariya miletê xwe bikin,herweha berdewam kir; ku em di despêkê de 35 pijîşk bûn,û niha hejmara me hin bi hin bêtir dibe. lê tevî wilo jî hin kemasî peyda dibin di karê me de, çi di warê derman û çi jî alavên dermankirinê .

pir kes vê yekê gaveke girîng û Erênî dibînin , ku girûpek ji pijîşkên bajêr bi vê pirije yê rabûne, herwiha xelkên Bajêr dibînin ku gava herî pêwîst ewe ku Alîkariyên berçav bi vê pirojeyê re bibe , ji Aliyê hemû partî , Sazî û rêxistinên siyasî û Civakî



# 80 SAL PERÎŞANÎ Û KARÊ GIRAN

*Gulal liyanî*



Rewşa jiyana zehemet a ku li tevaya Sûrî belavbûye,û li herêma Kurdî bi teybet,hişt ku diyerdeya perîşaniyê li ser rûberkî mezin di civakê de belav bibê,herwha bi sedan mirovên perîşan li temanê nanê xwe dimînin pirsyar,lê ya herî zehemt ku berpirsê malbatê kalemêr be,wek mam EBDULAH,kalmêreke li bajarê Girkê Legê dijî,bavê çar zarokê piçûke temenê wî 80 sale.

mam EBDULAH berî vê kirîzê firoşxana wî ya mirîşkan hebû di nîva bajêr de dûrî navenda bazarê bû,lê dema ku nirxê mirîşka hate hildan di vê dema dawî de,ew neçarma ku dest ji wî karî berda û dest bi firoştina şînahiyê kir di bazarê de di rojê de ji 15 kg ta 20 kg bi tenê bacanan difroşe.

mam EBDULAH ji kovara Welat re axifî û got:

"Ji sibehê ta nava rojê ez şînahî bi vê rêjeya biçok difroşim,da ez nanê melbata xwe peyda bikim û dema xelkên Girkê Legê tên şînahiyan li cem min dikirin ew gelekî alîkariyê bi min re dikin û buhayên bêhtir didin min"

Herweha di berdewamiya axiftina xwe de got:

"ez gelek bi kêf dibim dema ku diçime nav zarokên xwe bi ser firazî ez pêdiviyên wan peyda dikim!"

gelek mînak wek mam EBDULAH di herêma Girkê Legê de jiyana xwe bi zehemetî berdewam dikin û bi karê dest û xwêdana eniya xwe nanê xwe derdixin û peyda dikin,hertim di kirîzan de mirovên perîşan ew temanê kirîzî didin û datînin.

HÛN BI XÊR HATIN

# PARASTIN Û FÊRKIRINA ZIMANÊ KURDÎ

*Xalid Şêxo*

Ziman di jiyana gelan de giringtirîn hîm û sitûnê hebûnê ye li ser dirêjahiya dîroka mirovan de ji berî bi hezarên salan û ta vê gavê,zimanê nîşanê destpk bû ta ku tîp hate peydakirin,û ev pêşvebirin domand da ku gihişt asta ku îro em têde dijîn.

Miletê Kurd jî pareke ji vê malbata mirovayetî,a ku gelek êş û azar kişand ji boyî zimanê xwe yê resen,di ber sitem û zoriya destelatên zorbaz û xweperest de.

Ew destelatên ku dixwestin nasnameya zimaka Kurdî tune bikin û bin ax bikin,lê vîna berevanî û parastinê her xurt û bi hêztir bû,ji wan dîmenên parastinê berdewamiya pêkanîna zimanê Kurdî bû,tevlî ku komeleyek yekane bo ziman hêj tuneye.

Parastina zimanê Kurdî di gelek qonaxên dijwar û hejar de derbasbû,jê bi sedên kesan bi awayekî veşartî û dizî şagirt fêrdikirin,û gelek caran mamosteyên zimanê Kurdî dihatin girtin ji ber dana wan ji zimanekî qedexekirî.

Û li gorî vê qonaxê, diyare ku di Rojavayê Kurdistanê de saziya ku bêhtir berferh bûye û sûde daye ew Saziya Zimanê Kurdî ye , ev sazî dest bi karê xwe kir bi derbasbûna dibistanan,di riya dibistana Ş.Memûd el-şêx û dibistana Ebdulrehman el-Xafiqî li bajarê Serê Kaniyê,lê rêjîma Be›s bi vê gavê dilniya nebûn û dergehê ev herdu dibistan girin dora du mehan,û gotin ji rêveberên dibistanên din re eger hûn razî bibin ku zimanê Kurdî li gel we were dayin emê dibistanên we jî bigin !

Lê piştî ku komên tundrew û radîkal derbasî bajêr bûn û bi dûrketina hêzên rêjîmê ji herêmê,Saziya Zimanê Kurdî dîsan vegeriya dibistanan,di destpêkê de ne cihê vehesiyê bû li cem rêvebirên dibistanan,û ji piştre ev tişt hat wergerandin bo alîkarî beşdariyek duyane di navbera saziyê rêvebiran de.

Û li ser rewşa xwendevan û şagirtan bi taybetî yên ji pêkhatiyên din,ev gav û kar cihê razîbûnê bû ji destpêkê de li cem wan,û evan şagirtan bi xurtî xwestin fêrî zimanê Kurdî bibin.

Ji bilî vî tiştî,saziya ziman hilgirt li ser milê xwe navdana armeyên bi zimanê Kurdî li derbasbûna bajêr û her cihê derketinê,û xwestin ku navên Kurdî li keskayî û pêdawistên bazarê bikin û nirxên wan jî bi zimanê Kurdî bikin,lê ev tişt ne gihişt bervî dawî ji ber ku ew giran bû li ser firoşkaran bi tevayî.

Ji hêlek din ve,Saziya Zimanê Kurdî ta vê gavê bêtirî 700 kesî ji Serê Kaniyê fêrî ziman kiriye,li ser korsên ku bi sê qonaxan derbas dibe,û temenên derçûyan ji 16-40 salî,ji sedî 70 ji wan keç in.

Û vê gavê Saziya ziman li ser gelek korsan rawestiya ye,ji wan:

1-korsa qonaxa yekê,hejmar 1.

2-korsa qonaxa dudyan,hejmar3.

3-korsa qonaxa sisyan,ewê piştî dawiya meha rojiyê destpêbike.

4-korsa taybet bo nexwendeyan ku ji hemû temenan beşdarin têde,û li ser bîrdozek taybet ew pêktê.

Saziya Zimanê Kurdî rolek pir giring û pêwî dilîze di vê demê de bo vejandina çanda zimanê Kurdî,û fêrdan û waneyan pêşkêş dike li ser dîroka zimanê Kurdî



# Ronakek hûrbîn li beşê şuştina gurçikan di nexweşxaneya Dêrikê de

**Fener Ehmed**

Tiştên sereke di agahdariya tenduristiyê de li gel neteweyên pêşketî ewe baldariya li nexweşan e ên ku gerekdarên agahdarî û çavlêbûna dûr û dirjin.

Ew nexwşiyên ku buhayên gelekî giran li ser milê dewletan radiwestîne û bi pêdivîbûna alav û şêneyên taybet jî amade dibe,tevlî buhayên dermanan jî,weke navendên nexweşiya şekir û pençeşêrê û nexweşên gurçan…t.d

Li nexweşxaneya niştimanî ya li Dêrikê,beşê şuştina gurçikan heye,ya ku di sala 2008 an de serotar bû ji ber pêdiviya wê ya giring ji bo tevaya herêmê,û ji ber ku ev herêm dûrî bajarên mezine weku Şam û Heleb.

Di nava hevpetvîna me bi nexweşkar Şahiya Ismayîl re,seroka nexweşkariyê di beşê şuştina gurçikan de,wisa bo me axivî û got:

"Di beşê şuştina gurçikan de şeş alavên şuştinê têde heye,û cîgehek şêrînkirina avê jî heye bo vî beşî,em agahdariyê ji 50 nexweşî re dikin li gorî bîrdozeyek diyar û xuya,ew nexweşên ku li gel me ne ji bajarê Dêrikê û gunewarên wê ne,tevî hin nexweşên ji Serê Kaniyê û Dêra Zorê jî hatine nexweşxaneya me.

Hinek nexweş bo wan gereke şuştina gurçikê sê caran di hefteyê de,û hinek jî du caran, û her wisa li gorî pêdiviya her nexweşekî em bi karê xwe radibin û belê taqîkirina mehane bo wan teva dikin bi awayekî giştî û pisporî".

Û li ser pêdawist û dermanên ku li nexweşxaneyê hene Ismayîl wilo got:

"Beşê şuştina gurçikan ji wê re gereke pir derman û pêdawistên berdest ên rojane,ji ber ku bêyî wan ew kar ewê li paş be û têkçûyî bimîne.

Ji wan dermanan: (Sîrom,lûleyê şuştina gurçikan,pêdawistên xwîn kişanê, karbon û ji bilî wan jî pir kêmanî hene).

Û dermanên gerek bo me ev in(Hêbarîn-Eybotîn-Laskis û dermanên wekî din)

Gelek caran em ji dermanan têne birrîn,û ev jî kêmasiya Şahdariya Tenduristiyê ye ya li



Sûrî,û carnan jî ji ber buhabûnê û nemana wan dermanan li dermangehan.

Li ser vê rewşê jî du alavên me têkçûne û êdî kar nakin,em nikarin wan saz bikin vê gavê ji ber ku yedekên wan peydanabe di van rojan de".

Di hevdîtinek cuda de bi Mesû'd Ebdulla re,yê 28 salî ye, ji me re weha got:

"Ez ji berî sê salan bitêkçûna gurçikê bûme,û piştî ku rewşa min a tenduristî bêtir li paş ket ez gihiştim ziyanek dijwar hi ber gurçika xwe,ji lewma şuştina gurçikê bo min gereke,va bû sal û nîvek ez gerekdarê vê şuştinê bûm»

Mesû'd ji me re berdewam kir û got:

"Beşê şuştina gurçikan agahdariyek baş bo me dike, lê astengî di kêmaniya hin pêdawistan de heye,û gelek caran li nexweşxaneyê dermanên taybet tuneye,wê gave em neçar dibin ku em wan dermanan bikirin bi buhayên gelekî giran,û carnan em ji neçariyê van pêdawist û dermanan dabîn dikin ji Turkiyêyan jî ji herêma Kurdistanê.

Min bi xwe pir şê dît da ku min nirxê birînkariya çandina gurçikan peyda kir,lê rewşa ne saz û durist nehişt ku ez biçim Şamê bo vê birînkariyê,û ji ber wê jî her demekê ez gurçikên xwe dişom li vê navendê".

Zehmatî û belengaziya welatiyan bêtir dibe ji ber rewşên ne saz û kêm amoşî ku em têde derbas dibin,û metirsiyên giran û reş ji encamên van bûyerên li der dorê hene.

Hêjaye gotinê ku tenê li beşê şuştina gurçikan de li bajarê Dêrikê 16 nexweş jiyana xwe ji dest dane di nava her du salên borî de,ji ber tunebûna dermanan û negihiştina nexweşan bo Şam û Helebê da ku birînkariyê box we bikin û vegerin li ser tenduristiya xwe wekî berê

# Tevlî dorpêçkirinê her em li vir in

*Şêrîn Temo*

Kobanê,yan Eyn el-Ereb weku Ereb jê re dibêjin, li bakurê rojavayê bajarê Helebê dikeve,ev bû demeke ev bajar û gundên wî di rewşên dijwar û zehmet de dijî û derbasdibe,nemaze piştî ku rêxistina Îslamî ya tundrew DAYIŞ dest bi êrîşên xwe yên bê navber û hovane li ser vî bajarî û gundên wî kir,û şar û gundewarên wî ji sê aliyan de (rojhilat û rojava û başûr) dorpêç kir û ew ji hemû gewdeyê nexşa Sûriyê veqetandin û dest bi girtina welatiyên vê herêmê (Kobanê) yên ku ji herêmê derdikevin yan tên kir.

û tawan û gunehê van welatiyan tenê Kobanetî û kurdayetiya wan e,û di vê dawiyê de rêbendeka DAYIŞ komek ji xwendevanên vê herêmê girtin ku hejmara wan 149 xwendevan e, ew xwendevanên zarok ku ji 13-14 salî ne,dema ku li bajarê Helebê ezmûnên bawernameya qonaxa bingehîn pêşkêş dikirin,li vegerê û li ser rê,di nava bajarê Helebê û herêma Kobanê de hatin girtin, lê piştî destwerdana Komîteya Aştîbûna Niştimanî 15 ji wan xwendevanan hatin berdan lê hîn 134 heta roja îro di girtingehên bajarê Minbicê de ne .

Rewşa jiyanê li Kobanê ne li ser hev e, ji ber ku ew encama dorpêçkirineke sê alî ye,av û elektirîk yên ku bû bêtirî şeş mehan ji aliyê DAYIŞ de ji ser bajêr û piraniya gundan hatine birîn,hiştin ku jiyan li bajêr bibe dojeh,û welatî li çareyan bigerin;wek kolandina bîrên malan ji bo bidestxistina pêdiviyên malê ji avê,lê bi hatina germa havînê re ew bîr hemû miçiqîn, êdî milet dest bi kirîna avê kirin,ew ava bîrên çandiniyê ya ku di riya tankêran(embarên avê) re tête veguhestin bo bajêr.

Hêjaye gotinê ku bikaranîna ava bîran hişt gelek nexweşî li nav bajêr belav bibin,wek nexweşiya kolêra û ji bilî wê jî, nemaze di nav zarok û şîrmijan de.

Ji bo dabînkirin û bidestxistina elektirîkê jî,welatî motorên elektirîkê yên malan,çi yên berê li bajêr hebûn û çi yên ku di her awayên qaçax tînin, ew bi kar tînin.

Lê niha motorên elektirîkê yên mezin (her yek bêtirî 1000 ambêrî dide) ku elektirîkê didin hinek taxên bajêr û her roj ev motor bêtir dibine û arîşe hêdî hêdî hinekî çareser dibe.

Û weha ev dorpêçkirin dihêle ku keskayî û tiştên xwarinê yên din( şekir,birinc,çay…hd) bi qasî ku gereke negihêjin bajarê Kobanê û ev yek dihêle ku bazirgan her tiştî bi buhayên ku ew dixwazin bifroşin!.

Heger em berê xwe bidin bakur hinda dergehê sînor yê ku bi dewleta Tirkiyê re ye, emê bibîn ku ew dergeh ji aliyê Tirkiyê de venabe ji xeynî di rewşên awarte de(nexweşên ku rewşa wan xedar û aloz e,……).

Ev tiştan hemû hiştin ku asoyên tirsê li pêş çavên welatiyên vî bajarî bilindtir û ferehtir bibin,tirs ji pêşeroja nepenî û ji ev şerê ku xelkên vî bajarî ji ber wê neçar û belengaz bûne.

Gelek ji xelkên vî bajarî ji neçarî sînor derbaskirin,belkî li wî alî , li Tirkiyê karibin pariyek nanê xwe bixwin,û yên mayî jî li Kobanê,li hêviya ne tiştekî ne,li hêviya hêviyekê ne.

heviyeke ku nizanin wê ji kîjan alî de were,li vir in ew, li Kobanê, parastin û zêrevaniya bîrhatinên xwe dikin,ya goristan û axa bav û kalan dikin,li vê derê,ne tenê canik û camêrên Berazan,lê Kurdên ji her aliyên welêt,destaneyên berxwedanê,dastaneyên lehengiyê,bi xwîna xwe li ser rûpelên dîroka vî welatî dinivîsinin



# CEZÎRA KINAÇE DI NAVBERA GENDELIYÊN NÛ Û DORPÊÇKIRINÊ DE

*Hembervan Kosa*

Berî ku şoreşa Sûrî destpêbike,ji welatiyên Qamişlo ne dihat xwestin ji peyvî hin dirav bo kirîn û peydakirina pêdawistên rojane,û helbet mayinek dilînî di nava ezmanekî aborî de,ya ku girêdaya kirya destê welatî di her dawî mehekê de.

Bazara Qamişlo ya mezin a ku hemû pêdiviyê welatiyan bi cih danî û pêk dikir,ev roj bûye wekî agirekî dijwar û her tiştî disotîne bi xwe re ji ber buhabûna pir bilin,ev tişt ji bilî pawan kariya mezine ya ku li hemû pêdawist û kelopelan bûye giranî.

Ji piştî ku gelek welatî ji kar û pêbijiyên xwe dûr ketin û bê par man,û bi paş ketina dirava giştî ta bi astên pir nizm û lawaz ji ber aloziya rêzanî ya ku herêm tevde di nav de derbas dibe,û ji xwe bandora wê ya yekser li hemû aliyên jiyanê.

Bazara Qamişlo jî parek wê ji vê aloziyê hebû,û sedema vê buhabûnê li gorî nerînên gelek kesan vedgere li nehedana diravên biyanî wek Dolar û Ewro li hember Leyreya Sûrî,û ji ber bikaranîna bazarganan li ser kelopelên ji dervayî welat di riyên qaçax û ne rewa de.

Koçberiya bi tûmî jî ji deverên şer û germ bo Qamişlo ew jî sedemeke ji vê aloziyê û buhabûnê re ye,û ji ber van sideman ên ku di saya wan de welatî tenê bûye kelopelek,û van hemû bûyer pêktên bi rengekî bê hedan di rewşên bê destelat û pirsîniyê li ser firoşkaran û bazarganên vê bazarê.

Berzbûna gewre ya ku li bazara Qamişlo dibe ew encame ji dorpêçkirinê re,ya ku li teva herêmê diyar dibe,û ji ber dûrketina Şam û Heleb ji rola xwe di jiyana aborî de li ser qada bazarganiyê û pirsîniyê.

Pawan karî li dare,û welatiyên Sûrî bi çavekî melûl li pêşerojê dinêrin,û herêma Cezîrê ya kinaçe di nava gendeliyên nû û dorpêçkirinê de azarên xwe dikşîne û dijî.

Û ev jî lîsteyek beramberkiyê li ser nirxê hin kelopelan,berî Rojiyê û di nava Rojiyê de:

| Kelopel | Berî Rojiyê | di Rojiyê de |
|---|---|---|
| Mirîkên xweceyî | 425 | 530 |
| Mirîşkên biyan | 325 | 450 |
| Goştê ga | 1300 | 1400 |
| petat | 60 | 75 |
| firingî | 65 | 75 |
| fasolî | 40 | 150 |
| leymûn | 250 | 400 |



## XWENDEKAR Û EZMÛN

*Sa'don El Sîno*

Xwendekarên Bekeloryayê li bajarê Dirbêsiyê ev sal ezmûnên xwe di rewşeke awarte û dijwar de kirin.rewşa aborî ya li paş bandoreke neyinî li ser xwendina wan kiribû,û wisa jî nedikarîbûn korsên li derveyê dibidtanan bistînin jiber buhabûna wan.



Ji hêleke din ve nehedana rewşa ewlekarî ya herêmê bi giştî,ji ber ew ezmûnên wan li Hesekê û Qamişloyê bûn û gelek metirsî hebûn li ser rêyan bi taybetî jî rêyên Hesekê.

Lê tevî van mercan du keçên xwendekar ji bajêr karibûn ku asteyên bilind bidest bixin ew jî Lîlav Mihemed Elî û Novîn Osman Derwîş in.

Di hevpeyvînekê de li gel Welat,Lîlav 237 pile wisa axift:

min nikarîbû korsan bistînim,û ta bi dibistanê jî baş bikar nedihat û mamostayên wan guh nedidan xwendekaran,û astengiyeke din jî hebû ew jî birîna elektirîkê bû,tevî van hemû pirisgirêkan ez vîndar bûm ku ez xwendina xwe bi şêweyeke durist bikim û kêfxweş im ku ez bi ser ketim û min şahî xiste dilê dayik û bavê xwe de ku wan gelek ked ji min re kiribûn ta ez bigihêjim vê astê.

Novîn Derwîş 239 pile wisa ji me re axift:

mirovên min gelekî alîkarî bi min re kiribûn,ew ji min re her tişt peyda dikirin da ez bikaribi xwendina xwe bi awayeke rast bikim.tevî rewşa aloz a ku em di wê de derbas dibûn weke pêwariya elektirîkê û aboriya lawaz û metirsiyên ewlekarî,lê dilşad im ku ez bi ser ketim û min ev pileyên bilind bi dest xistibûn.

Neyaza Novîn jî ew e ku xwendina bijîşkî di zanîngehê de bixwîne.

Ne tenê ev bûn tiştên ku bandoreke neyinî li ser xwendekarên bekeloryayê kiribûn,lê ta di ezmûnan de jî gelek ziyan hebûn weke tevlîheviya ku çêdibû,pirsên ku beriya ezmûnê derdiketin û bikaranîna mobayil û înternêtê hemû dibûne astengî di rêya xwendekarên jêhatî ku ew ezmûnan baş bikar bihênin û ew jî di heman demê de dibine sedemên ku nifşeke ne durist ji xwendekaran bêne holê,çimkî ew ne bi keda xwe dê bi serkevin lê bi rêyên ne durist.

## KARKIRINA ZAROKAN



*Sozdar Tirbeispî*

Di Cezîrê de û Tirbesipiyê jî yek jê,birîna perîşaniyê ya ku ji laşê mirovên we xwar,yek ji rengên vê birînê karkirina zarokan e,û ew tê ji malbatên herî perîşan..

Firoştina cixaran û karên zehmet, mînak: karmendiya avakirina malan,kargehên bilokan an jî cihên sazkirina otombîlan,û sedemên dihêle ku zarok ji dibistan û xwendina xwe dûrbikeve yek ji sideman ewe bêkariya bav e,ku niha karek nemaye di Tirbesipiyê de,yan jî bav bi xwe nikare tu karî bike ji ber rewşa xwe ya tenduristî,yan jî bav naxwaze bike û ew dikare her karekî bike.

yek ji sedeman jî ku zarok naxwaze here dibistanê, û di wê gavê de malbata wî têne zorkirin ku êdî wî bişînin karekî bo ku fêrbibe û rojekê karibe jiyana xwe ya rojane derbas bike bê alîkariya tu kesî.

# Girê Mozan (Orkêş)

*Alan Alûcî*

Mozan girekî dîrokî ye li Rojavayê Kurdistanê ,ew bi şêweyê xwe yî avahî ji hemû girên bajêr ciyawaze, ji ber ku ew ji heft girên bi hevgirêdayî hatiye avakirin ji axa mûş (beyar)

Rûberê girê Mozan nêzî( 40) hiktaran e,û bi bilindahiya ( 20.25)m li rojhilatê Amûdê dikeve bi dûrbûna (7)k.m an û li bakurê parêzgeha Hesekê ye bi (100) k.m, navenda bingehî ji şaristaniya Hûriya ye,li gorî belgeyan hijmara neşteciyên bajarê Orkêş gihiştibû 20 hezar kes,û Orkêş şarestaniyeke pêşketîbû bi sedema ku ew li ser riya bazirganiyê hatibû avakirin .

Û ew tê nasîn bi navê Orkêş lê ev nav bi gelek wateyan tête şîrovekirin

li gorî ku di hin efsaneyan de hatiye nivîsandin bi taybet yên olî ku didêje Orkêş tê bi wateya (şarê şêr) bi zimanê Şomerî,bi taybet piştî dîtina pûtê du şêran di hindirê koşka şah de ji hêla şanda Emerîkî (or) şare, û (kêş)şêre .

û hin jî dibêjin Orkêş ji agirê geş hatiye (ar_geş) û dîtir dibêjin Orkêş navê şahê wî bajarî bû .

dêmek bajarê Orkêş giringtirîn Navenda şaristanî di jiyana Sûrî ya dîrokî de ye,di orta hezareya sêyan de berî zayînê.

di sala 1984 şandeke Emerîkî ya kevneşopê bi serokatiya pirofîsor Corciyo botişlatî û pirofîor markin kîlî li wir xebitîn û piştî vekolînê şanda Corciyo gihişt yekem paytexta Hûriya dema ku koşka şah berçavkir (orkêş) û di hindirê koşkê de tabloyek kevirî li ser neqişandî navê şah (tobkêş) û hevjîna wî (oknîtom), lewra ev koşk ji sê beşan hatibû avakirin .

beşekî xizmetkariyê, beşek yê dîwanê û yê din baskê şahane.

ji bilî wan bi 100an muhr hatin berçavkirin û wêneyên lawer û berhemên çandiyê li ser neqişandîbûn

lewma ev muhre tekez dikin ku bajarê Orkêş bêhtir li ser perwerdeya laweran û çandiniyê jiyana xwe ya abûrî berdewam dikirin .

ne tenê Orkêş lê bi dehan deverên dîrokî li Rojavayê Kurdistanê de hene,û di hindurê xwe de şaristaniyên kevnar vedişêrin, lê îro ew hatine paşguhxistin,û gelek kevneşopên me hatin vedizîn, û di mozexaneyên dewletên corbecor têne pêşan kirin

tu kes li van samanên ku xaka me bi wan dewlemende xwedî dernakevin ,û metirsîk rasteqîne heye ku yên mane jî bêne dizîn bo dervey welat.







## PELÊN DARA ELÎVKÊ –ZEYTÛNÊ- JÎ SÛDARIN

***Dr. Hajî***

Wek em hemî dizanin çiqasî elîvk (zeytûn) û donê wê ji bo tenduristîyê bi sûde ne.

Lê ta nûha kesekî ji me nizanîbû ku pelên dara elîvkê (Zeytûnê)jî wiqasî bi sûdin. Lêkolînên dawî di vê babetê de didin xuyanîkirin ku,pelên dara zeytûnê pir zengîne bi kiresteya Ulorubîn ya ku dema dirbasî laşê mirov dibe diherife û dihele û ji wê kiristeya wênolît Kalsyom derdikeve,wênolît Kalisyom nahêle ku Kolîstrol bi Oksicîna xwînê re bebe yek,û ev dibe sedem ku pelikên xwînê(yên ku berpirsyarê xwînmeyandinê ne di xwînê de) di hundirê damarên xwînê de na civin ser hev û bi vî awayî xwînmeyandin di damaran de pêk nayê .

Ev yek dibe sedema parastina dil û damarên xwînê ji xwînmeyandinê.Vexwarina ava pelên dara zeytûnê ya kelandî rojê carekî dibe sedem ku asta kolîstrol û donên sêkane di xwînê de nimz bibin.

pelên dara zeytûnê wek dijî mîkrob û dijî vîrûs jî tê bikaranîn.

jêder:

www.facebook.com/TenduristiyaGel



# سلبيات الزواج المبكر

نوفين مرعي



يختلف مفهوم العلاقات الزوجية من شعب إلى آخر وأحيانا من شخص إلى آخر فهناك تباين واختلاف في مستويات النظر إلى هذه العلاقة,ففي الوقت الذي نجد فيه بأن هذه العلاقة تبنى في بعض المجتمعات على أسس من التفاهم والاحترام المتبادل بين الرجل والمرأة والشعور بالمسؤولية لتكوين أسرة مستقرة متآلفة و معطاءة,تمتلك الإمكانيات العلمية والمعرفية الصحيحة لتربية جيل متحرر من قيم التخلف ومن العقد والأمراض النفسية وقادر على قيادة المجتمع نحو التطور والارتقاء,نجد في بعض المجتمعات وخاصة الشرقية منها,أن الغاية من الزواج قد يكون لغرض تلبية الغريزة ولا يوجد أي تكافئ بين حقوق الرجل والمرأة,فالرجل في المجتمعات المتخلفة ينظر إلى المرأة بأنها قد خلقت لتكون ربة منزل وجسد لتلبية الغرائز والشهوة ومزرعة لإنتاج الأطفال لزيادة نسله وخاصة الذكور منهم, مما يخلق في هذه المجتمعات الكثير من العلل والأمراض الاجتماعية المتنوعة والعديد من الاختلافات ضمن الأسر.

ومن بين الظواهر السلبية الشائعة المتعلقة بالزواج في مجتمعاتنا ظاهرة الزواج المبكر أي ما دون سن الثامنة عشرة من العمر,ففي هذه المرحلة لا يملك الإنسان بشكل عام الوعي الكامل بالزواج وما يترتب عليه من مسؤولية,وتكثر العوامل المؤدية إلى هذا الزواج,فهناك الكثير من القيود والخطوط الحمر المتمثلة بالعادات التقاليد تحيط بالشاب والفتاة مما يدفعهما إلى الزواج المبكر لملئ الفراغ العاطفي الذي يعانون منه دون التفكير بشكل سوي,وهناك من يقدم على تزويج بناته وهن صغيرات في السن بسبب حالتهم المادية السيئة أو أن يكون لديه عدد كبير من الفتيات فيتم تزويجهن للتخلص من مسؤوليتهن,وأيضا هناك من يزوج بناته خوفاً من أن يقمن بأي سلوك منحرف يسبب لهم الحرج أمام المجتمع.

وبصيغة أوضح يمكن القول بأن العديد من المشاكل والخلافات الزوجية يسببه الزواج المبكر وذلك لعدم الانسجام والتآلف بين الشريكين لوجود فارق العمر بينهما والصعوبة في تربية الأطفال, وقد تؤدي هذه المشاكل وفي أحيانا كثيرة إلى الطلاق مخلفين بذلك أطفال بؤساء ورائهم أو يعلقان في زواج فاشل لا يستطيعان الخروج منه بسبب العادات المتبعة لدينا. فالسيدة (م ,ش) البالغة من العمر ٢٢ سنة مطلقة وأم لطفل تقول بأنها قد تزوجت في سن السادسة عشرة ولم تكن تدرك شيئا عن الزواج سوا أنها سوف تلبس الأبيض ويقام لها حفل وتتباهى بذلك أمام صديقاتها,لتصدم بعد ذلك بواقع اكبر منها بكثير حتم عليها بأن تكون كبيرة في الوقت الذي كانت فيه صغيرة مما سبب لها الكثير من المشاكل,وأضافت قائلة « بأنني كنت صغيرة وأتصرف حسب عمري وظلت اهتماماتي اهتمامات فتاة مراهقة وحتى تفكيري,وهذا ما لم يتقبله عائلة زوجي وعندها بدأت المشاكل, فقد كان مطلوب مني أن أكون أكبر بكثير في الوقت الذي لم أكن أقدر على ذلك وانتهى بي الأمر مطلقة وأنا حامل بطفلي وعمري ٢٠ سنة»

ويسبب جهل الأهل في الكثير من الأحيان إلى ضياع أولادهم في زيجات تفوق طاقتهم وعمرهم,(ف أم جوان) البالغة من العمر ٢٤ سنة وأم ل ثلاثة أطفال تقول»عندما تقدم زوجي لخطبتي كنت صغيرة في سن السابعة عشرة ومازلت أدرس إلا أن حالته المادية الجيدة جعلت أهلي يقنعونني لكي أتزوجه وتركت دراستي بالرغم من أنني كنتُ من المتفوقات لأصبح زوجة وأم في عمر صغير وليست لدي أية معرفة في تربية الأطفال, فقد تغيرت عادات كثيرة في حياتي فتصرفاتي باتت محسوبة وحتى طريقة ثيابي قد تغيرت فلم أعد أشعر ببهجة الحياة كما في السابق فالخروج من المنزل أصبح قليلاً ولم يكن العائق هو طفلي وإنما الزواج بحد ذاته يغير من نمط الحياة»

وأضافت متحسرة على حالها « أن صديقاتي قد قمن بإكمال دراستهن الجامعية وعشن جميع المراحل العمرية الطبيعة ليتزوجن بعدها أما أنا فأشعر بأنني قد هرمت وأنا لازلت في الرابعة والعشرين من عمري «

فما ينطبق على النساء ينطبق على الشباب أيضاً فالكثير من الشباب تزوجوا في سن مبكرة دون أن يعوا مسؤولية الزواج ومسؤولية الأطفال فالشاب( م , د) البالغ من العمر ٣٠ سنة يقول لقد تزوجت في سن العشرين وقد نصحني أهلي بعدم الزواج في هذه السن ولكنني رفضت وتزوجت لقد كنت سعيداً في أول سنة وبعدها شعرت بأنني قد تسرعت وخاصة بعد أن أصبحت لدي طفلة,ففي الوقت الذي كان فيه أصدقائي يدرسون ويتمتعون بحياتهم فأنا كنت أقوم بشراء الفوض والحليب لطفلتي,عندها أدركت بأنه قد فاتني الكثير وقد ركضت وراء غريزتي ولم اعش حياتي بالشكل المناسب وانعكس ذلك بشكل سلبي علي فقد أردت أن أكون مثل أصدقائي وأنا متزوج فتورطت في علاقات عاطفية عدة وحتى لم أعد أهتم بأطفالي كما في الأول وهذا ما يجعلني أشعر بذنب كبير.. واختتم كلامه بقوله أنا أتمنى أن لا يتزوج أي شاب في عمر مبكر لكي لا يقترف ما اقترفته بحق أولادي وزوجتي»

أما من الناحية الصحية فالأطباء يؤكدون أن مرحلة المراهقة تتسم بالاضطرابات الهرمونية وعدم الاستقرار النفسي, فالمشاعر تكون متذبذبة ما بين السلب والإيجاب وتتأثر بالغريزة بشكل كبير بعيدا عن النضج والعقلانية لذا فأي قرار في هذا العمر لا يكون نابعا عن التفكير السليم بالزواج و أنما يكون نابعا بشكل اكبر من العواطف الغير المستقرة.

وفيما يتعلق بصحة الفتاة في الزواج المبكر له تأثيرات سلبية كثيرة فبحسب ما قالته طبيبة نسائية « أن زواج الفتاة في سن مبكرة لها أضرار كبيرة على صحتها الجسدية والنفسية معاً فالجسم يكون في مرحلة النمو وخاصة منطقة الحوض حيث تكون هشة ولينة مما يؤثر على الحمل و الإنجاب فقد تفقد الفتاة حياتها أثناء الولادة أو قد تصاب بأمراض عدة بعد الولادة كفقر الدم وأمراض البول والسكري وضغط الدم و بالاكتئاب النفسي لعدم قدرتها على التعامل مع ظروف الحياة الجديدة بسبب صغر عمرها «

وأضافت أيضاً «أن الرحم لا يكون مهيئا للحمل مباشرة بعد البلوغ الأولي الذي يكون في العادة ما بين سن ٩ إلى ١٤ فدورة الإباضة الطبيعية قد تحتاج إلى أكثر من خمس سنوات بعد ذلك ليكتمل ويصبح الرحم قابل لاستقبال الجنين,لذا قد تتعرض الفتاة لمشاكل عدة بسبب ذلك, مما قد يؤدي إلى الطلاق أو تعدد الزوجات».

ومن جهة أخرى لا يخفى وجود إيجابيات في الزواج المبكر فعمر الأطفال يكون مناسبا لإعالة ذويهم في المستقبل,بالإضافة إلى أن الزواج المبكر قد يقي الفرد من القيام بأي سلوك منحرف وشاذ ولكن يجب توعية كلا من الشاب والفتاة الصغار في العمر قبل الزواج عبر مؤسسات تهتم بقضايا الأسرة والمجتمع لكي يستطيعا التعامل مع التغيرات والظروف الحياتية الجديدة ويكون لديهم وعي ومعرفة كاملة بكيفية تربية الأطفال.

ولكن قدر الإمكان يجب أن تستمر الحياة بمراحلها الطبيعية جميعاً طفولة مراهقة وشباب ومن ثم الزواج من أجل إيجاد مجتمع قوي ومتماسك

# الإرشاد النفسي // مفهومه و الحاجة إليه //

## كمرة أيو

**- يعيش الإنسان في المجتمع و لديه مجموعة من الحاجات يسعة لتحقيقها في إطار العلاقات الاجتماعية و هو لا يستطيع تأمين حاجاته بنفسه دائماً بل يحتاج إلى مساعدة الآخرين مادياً و معنوياً أو في الاستشارة أو اتخاذ الرأي . و نجد الإنسان في بعض الأحيان حائداً في أمر ما لا يعرف ما يحب أن يعرفه و أي طريق يختاره فهو في حاجة إلى مَن يرشده و يهيده إلى الطريق الصحيح و يساعده على حل مشكلاته . إننا نعلم بأن طلب المساعدة و المشاركة الوجدانية من المحيطين بالإنسان قديمة قدم البشر , إلا أن البداية الحقيقية للإرشاد النفسي علماً مستقبلاً بدأ عام ١٨٧٩ م وهو العام الذي استقلّ فيه علم النفس عن الفلسفة .**

**// تعريف الإرشادالنفسي //**

الإرشاد عملية موجهة تعليمياً تتم في إطار بيئة اجتماعية بين شخصين حيث المرشد وهو شخص متخصص و ماهر في المعارض و المهارات النفسية يحاول مساعدة المسترشد بالطرق التي تتناسب حاجات حاجات هذا المسترشد في إطار برنامج التوجيه ليتعلم أكثر عن ذاته و يتعلم أن يستفيد من ذلك في تحقيق أهداف واقعية و مجددة توصله إلى أن يكون أكثر سعادة و إنتاجاً في أسرته و مجتمعه .

**// دواعي الإرشاد النفسي //**

نعيش الآن في عالم متغير شديد السرعة يتطور باستمرار و مع هذا التغير و التطور في مختلف نواحي الحياة تبرز احتياجات جديدة للإنسان و تحديات كثيرة و مشكلات متعددة تتطلب وجود الإرشاد النفسي : و أهم هذه الدواعي : ١- التقدم العلمي و التقني و ما أحدثه و يحدثه من تغيرات كبيرة في مفاهيم الحياة فاختفت مهن و ظهور مهن جديدة تستدعي تدريب الأيدي العامل و تطوير برامج الدراسة و التدريب و تأمين المستلزمات الضرورية . ٢- التغير في عالم الاقتصاد و المال و ظهر التكتلات الاقتصادية و الشركات العملاقة ٣- التقدم الكبير في وسائل الاتصال و المعلوماتية و تدفق المعلومات ؟ ٤- الزيادة السكانية التي ولدت الكثير من المشكلات كنقص الغذاء و تلوث البيئة و انخفاض مستويات المعيشة و عجز المدارس عن استيعاب الأفواج الكثيرة من الطلاب . ٥- التغيرات الاجتماعية المتسارعة و تخلخل القيم وضياعها في بعض الأحيان . ٦- القلق من الفوضى و المجهول و عدم الاستقرار في النظام العالمي الجديد . ٧- النظر للتفوق و رفع مستوى التحصيل عند الطالب على أنه الاهتمام الأكبر له و لأسرته و ما يرافق ذلك من ضغوط نفسية وتوتر و قلق عند الطالب



و ذويه .

إن هذه الأسباب أو الدواعي فرضَت نفسها على الواقع التربوي و وضعته أمام تحديات جديدة لا بد من مواجهتها وهذه التحديات تواجه الطالب والأهل و المعلم و المنهاج , و كل ما يتعلق بالعملية التربوية . و من هنا برزت الحاجة إلى الإرشاد النفسي التربوي في المدارس للتصدي لهذه التحديات التي تزداد اتساعاً و عمقاً مع تقدم الحياة و تعقيداتها و اتساع أدوار المدارس الحديثة وفي الوقت نفسه تبدو الحاجة ملحة للمحافظة على صحة الطالب النفسية و قدرته على التوافق بينه و بين نفسه و مجتمعه والعالم ليصبح أكثر تفاعلاً وإنتاجاً و أكثر شعوراً بالرضا و السعادة و الصحة النفسية

- إننا نلاحظ في الميدان تساؤلات كثيرة تثار حول دور المرشد النفسي التربوي في المدارس و ما يصيب ذلك من تشويه أحياناً و قصور في المعرفة أحياناً أخرى بسبب حداثة موضوع الإرشادالنفسي و تطبيقه و القناعة المحدودة الأفق عند بعض العاملين في الميدان التربوي وعدم قيام بعض المرشدين بالدور المأول منهم وهذا يتطلب التوعية الضرورية بأهمية الإرشاد النفسي و دوره في مساعدة أبنائنا على مواجهة المشكلات التي تعترضهم وحلها وفي الوقت نفسه لا بد من التأهيل الجيد للمرشدين وتدريبهم من خلاص تركيز القاعدة النظرية للإرشاد و التدريب العملي التطبيقي لأن التدريب المستمر يشكل ضرورة ملحة في جميع المهم و يبدو في مهنه الإرشاد النفسي أكثر إلحاحاً و أشد خطورة لأن التعليم بدون تدريب مقدرة عمياء, و التدريب بدون أساس علمي تدريب ناقص و ممارسة الإرشاد بدون تعليم و تدريب ممارسة فاشلة.

وفي الختام نشير بأن المستقبل سيحمل في طياته تطورات أكبر و متطلبات أكثر و تحديات أخطر و هذا يفرض علينا جميعاً معلمين و أولياء و مرشدين أن نركز على تربية أبنائنا و رعايتهم و نمو شخصياتهم النمو المتوازن و المتكامل و نحافظ على صحتهم النفسية و نشجع لديهم روح الإبداع و الابتكار و ننمي لديهم الشعور بالمسؤولية و الاعتماد على النفس مستفيدين من معطيات العلم و التقانة

# تعالوا نتعلم ثقافة الاعتذار...!

## هلبست يوسف

تعد ثقافة الاعتذار ضرورة لابد منها لدى أي شخص منا، فهي دليل وعي، وسعة أفق، وعلينا أن نتعامل بها في الحياة اليومية، ولو من أجل هفوة ولوصغيرة، لنتمرن على تعاطيها بشكل يومي، ومخطىء منا من يتوقع أنه فوق الأخطاء، فليس من بني آدم لايخطىء، ولكن هؤلاء الذين يستفيدون من أخطائهم ويجعلونها جسراً نحو الصواب، وبناء شخصياتهم، هم المستفيدون مع أخطائهم مع الآخرين.

ولقد اعتدنا أن نجد البعض الذي ما إن يخطىء حتى يلجأ إلى التبريرات، وهو من النوع الذي يريد التخلص من الخطأ لكنه يقع في خطأ آخر، وإن إدمان الشخص على هذا الشكل من التعامل مع المحيط الاجتماعي، يجعله يعيش شخصية أخرى، شخصية مغرورة تدعي أنها فوق الأخطاء، لكنها تعيشٍ صراعها الداخلي، وتفتقد الثقة بنفسها، وتفقد ثقة الآخرين بها أيضاً.

يتوهم البعض أن أي اعتراف بالتقصير أو الخطأ يعني التقليل من شأنه مع أن الاعتراف بالخطأ بحق الذين حوله ابتداء من أهل بيته وأقربائه ومروراً بزملائه في المدرسة أوالتعليم أوجيرانه أو محيطه الاجتماعي يزيد شخصيته قوة، ويزيدها تأثيرا، ويجعلها محترمة من قبل هؤلاء، بل قبل كل شيء إن هذا الشخص يكبر في عيني نفسه، وهو مهم جداً، لأن على أي منا أن يثق بنفسه قبل الثقة بالآخرين.

والاعتراف بالخطأ يعتبر شجاعة كاملة، وهوسمة حضارية راقية، وانتشارها في أي مجتمع فهودليل على الروح الحضارية التي يتمتع بها هذا المجتمع، وتذكر بعض الدراسات أن المجتمع الياباني من المجتمعات



التي تربي أبناءها على ثقافة الاعتذار، حيث تجد الفرد في اليابان يعبرعن حالة الاعتذار أمام أي خطأ يصدر عنه بكل أحاسيسه، حيث ينحني أمام من ارتكب أية هفوة ولوصغيرة بحقه، ولوبشكل عفوي غيرمقصود، وهذا مايجعل هذا الشخص يكبرفي نظرة الشخص الذي يتم الاعتذارله.

وأتذكرأني قرأت ذات مرة أنه في الثقافة البوذية توجد ماتسمى ب "التعاليم الخمسة" وهي الصدق في كلمة "نعم" ومراجعة النفس في كلمة "آسف" والتواضع في كلمة "بفضل فلان" والتفاني في خدمة الآخرين في كلمة "أنا أريد أن أقوم بكذا.." وأخيراً الشكر والامتنان في كلمة "شكراً".

كما أنه علينا ألا نحكم حكما سريعا غير عادل على أحد قبل أن نعرف الأسباب الحقيقية التي دعته يقوم بأي تصرف كان ، لأننا بعد معرفتنا لتلك الأسباب ربما يتغير رأينا بالكامل تجاه هذا الشخص ، كما يجب أن يتقبل الطرف الآخر الاعتذار على الخطأ ويسامحه بعد أن يتأكد أن هذا الاعتذار مبني على أساس صدق المشاعر .

نحن بحاجة إلى تعزيز هذه الثقافة وغرسها في مجتمعنا، في بيوتنا وبين الصغار من خلال الإرشادات و البحوث التي تمت اكتشافها من قبل الكثيرين ، بل و نحتاج إلى وزارة لهذه الثقافة للحد من نسبة المتضررين من وراء ضعف نفس شخصنا ونشرها بيننا فنحن نفتقر إلى مثل هذه الثقافة في بلادنا وبين بعضنا البعض

Welat

Hejmar
13
01/09/2014





Welato goka xwe winda kiriye, hûn karin alîkariya wî bikin?







## PEYVA WENDAYÎ

Peyva wendayî ji 7 tîpaye , navê Feylesûfê zimanê Kurdî ye .

Ap – zû – al – şar – doz – dil – rê – azda – aram – şîn – aş – sêv – mar – şêro – soza – şîlan – zar – kavîn .

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | | | |

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| C | L | R | A | A | D | Z | Û |
| A | A | R | R | Ê | Z | O | E |
| Ş | A | L | D | I | L | D | Z |
| M | N | A | L | Î | Ş | A | A |
| Ş | Ş | K | A | V | Î | N | A |
| S | Ê | Î | Z | A | R | Z | A |
| A | Ê | R | N | D | O | E | Ş |
| P | T | V | O | S | M | A | R |

## Jimara bi tenê

Cihê vala di her malikê de bi jimara gerek dagre, lê divê ku tenê carekê jimar were dagrtin di her malekê de, û herweha divê ku tenê carekê were dagrtin li ser xêza asoyî û serjêr .

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | 4 | 6 | | 8 | 9 | 1 | 2 |
| | 7 | 2 | | | | 3 | 4 | 8 |
| 1 | | | 3 | 4 | 2 | 5 | | 7 |
| | 5 | 9 | 7 | | 1 | 4 | 2 | |
| | 2 | 6 | | 5 | | 7 | 9 | |
| | 1 | 3 | 9 | | 4 | 8 | 5 | |
| 9 | | 1 | 5 | 3 | 7 | | | 4 |
| 2 | 8 | 7 | | | | 6 | 3 | |
| 3 | 4 | 5 | 2 | | 6 | 1 | | |

## XAÇERÊZ

**Asoyî :**

1-navê vê kovarê (b) .

2-ji zayinê ye (b) – mizdan bi latînî .

3-parêzgehek beravî li Sûryê.

4-navekî keçan e.

5-çar tîp ji peyva zencîr.

6-xak(b) – bo pirsa kesan – tersê bir (b) .

7-navekî lawan e (b) – belê (b).

8-kêşeya baweriyê – nave balendekî ye(b).

**Serjêr:**

1-tersê şêrîn – tiyatro .

2-navekî lawan e – birayê dê .

3-daxwaz û armanc.

4-parzemînek biyanî ye .

5-dengê giriyê zarokên biçûk.

6-akar – terse diçe (b) .

7-dost û aşiq(b) – xiyar .

8-navê xwedanê kovara Hawar ê .

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | | | ■ | | ■ |
| 2 | | | ■ | | | | | |
| 3 | | | | | | | | |
| 4 | ■ | | | | | | ■ | |
| 5 | | ■ | | | | | ■ | |
| 6 | | | ■ | | | ■ | | |
| 7 | | | | | ■ | | | |
| 8 | | | ■ | ■ | | | | |

## Pend û şîretên Kurdî

1-ji her hespekê re siwarek heye!

2-şeva reş ji pêşî de reş e !

3-yê ku hêkekê bidize ewê welatekî jî bidize !

4-ma ew jî mî ba, ewê li nav kêrî be !

5-destê westyayî li zikê têr e !

## Ferhengok

| | |
|---|---|
| الفاسق | Bedkar |
| فاكهة مجففة | Beleçek |
| فتحة | Kun |
| فخر | Şanazî |
| فُرصة | Derfet |
| فرض | Sepandin |
| فرق | Ceywazî |
| فروسية | Siwarênî |
| فريسة | Nêçîr |
| فسيفساء | Kaşî |
| فشل | Nûçdan |
| فصل-موسم | Werz |
| الفراغ | Valayî |
| الفضول | Serbizêwî |

Xweşnav Heso

توزع مجاناً

# Amûdê...

Dema ku dem dibe
bi tama dama...




welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya



Welat

ولات: مجلة شهرية ثقافية عامة

العدد (١٣) ٢٠١٤/٩/١